## Çima çendcar bikarhatî?

Her sal derdora 350.000 ton bermahîkên têkildarî feraqên yekcarî û pakêtkirinê li beşa derveber (siparîşa bo derve) berhem tên. Ji vê mîqdarê amadekirina xwarinê ya pergalmend û jemên pêreyî her yek bi qasî yek ji sêyê bermahîkan derbasî vê gerîneyê dikin. Di vê navberê de bermahîk û zibilên nav kolanê bi qasî sedî 40 ji pakêtên derveber pêk hatiye. Ji bo bajar û navçeyan ev yek bi wateya salane 720 miliyon Euro lêçûnên paqijî û jêbirina bermahîkan e.

Mixabin feraqên yekcarî yên qurstir û qahêmtir jî rêkara vê pirsgirêkê nînin. Pirraniya pakêtên kaxizî yên qehwweyî yên bi rûkeş ji plastîkê ne û ji ber vê yekê bi dijwarî dikarin werin nûvebikaranîn. Ji bilî vêya, pakêtên ku dikarin werin komposetkirin, wek mînak ji plastîka jîngehî (Bayoplastîk), tenê bi rêjeyeke hindik dikarin werin komposetkirin.


© iStockphoto / Aleksandra Aleroeva

## Pêspartiya Me

Kampanyaya MISSION MEHRWEG (Pêspartiya Çendcarî) ji Hezîrana 2022an berdewam e. Pêspartiya me kişandina balê ser guherandina qanûnan, avakirina tora navçeyan û ragihandina kompaniyên çêkirina xwarekê derbarê pêwîstiya raberkirina feraqên çendcarî ye. Me dil heye kesan li ser vê mijarê qanih bikin ku em neçar in çavkaniyan biparêzin û her yek dikare pişkeke xwe di vî karî de hebe.

## Zanyariyên zêdetir

Gelo tu dixwazî zanyarîne zêdetir li ser babeta çendcar bikaranînê û qanûnê bi dest bixî û çawa dikarî vê yekê bi cih bînî? Em li malpera xwe alîkariya te dikin ku serdestiya li ser kar û pîşeya xwe biparêzî û standardên tenduristî û paqijiyê bişopînî.

Rêzik, pergalên gîroyî (Pfandsysteme) di berawirdkirinê de û gelek babetên din li malpera me hene:
**MISSIONMEHRWEG.DE**

Têkildarî pirsên taybet ên li ser rêzikên tenduristiyê, ji kerema xwe serdana navçeyên xwe yan rêveberiyên têkildar bike.



© iStockphoto / FilippoBacci

Piştevanîkirî ji aliyê
Freistaat Thüringen
Ministerium für Umwelt, Energie und Naturschutz
DEUTSCHE POSTCODE LOTTERIE
THÜRINGEN TO GO MISSION MEHRWEG
Berhemek ji
ZUKUNFTSFÄHIGES Thüringen e.V.

# Babetên din ên herî giring di awirekê de

Ji roja 01.01.2023 va li Almanyayê pêwîstiya raberkirina bi rêya çendcar bikaranînê tê sepandin. Ev pêwîstî ji bo hemî xwaringeh, xwarekên lezgîn, qehwexane, xizmetên radestkirinê, her wiha rêzefiroşgehên xwarinên bilez (Festfûd) e ku xwarin û vexwarinkên xwe li pakêtên derveber raber dikin.

## Ji bo kîjan cûreya pakêtkirinê, dewsgirên çendcarî hewce ye?

Kompaniyên têkildar divê ji bo**perdaxên yekcar-bikarhatî** hertim dewsgireke çendcar-bikarhatî raber bikin.

Ji bo **pakêtkirinên têkildarî bixwerebirina xwarekê** di rewşekê de divê dewsgireke dîsan-bikarhatî were raberkirin ku feraqên yekcarî, pakêtên plastîkî yan ew pakêt bin ku rûkêşa wan a plastîkî heye. Biryardan ji bo qebûlkirin an redkirina dewsgireke çendcarî hema wisa dê li ustiyê mişteriyan be.



© iStockphoto / EvgeniiAnd




## Gelo feraqên ku hevrê digel mişteriyan hatine divê werin tijîkirin?

Pêwîstiya tijîkirina feraqên hawirde yên mişteriyan ji bo **hemî** kompaniyan e. Feraqên hawirde divê paqij bin. Paqijkirin û materyal di berpirsyariya mişteriyan de ye. Bi her awayî ev feraq divê vala bin.

## Kîjan kompaniyan digire ber xwe?

Kompaniyên amadekirina xwarekê yên bi zêdeyî 5 karmendan/ yan zêdetir ji 80 mitrên çarkunc rûbera firotinê erkdar in ku dewsgireke çendcar bikarhatî ji bo pakêtên yekcarî raber bikin û **derbarê vê dewsgirê bi awayekî bînbarî ku were dîtin, bi başî ragihînin**. Hemî beşên gihêjbar ji bo mişterî û bikarhêneran wek rûbera firotinê tê hesibandin.

Dewsgirên çendcar bikarhatî nabe ku bihatir ji feraqên yekcarî bin. Pereyek wek gîro (rehîne) dikare were wergirtin. Pakêtên çendcarî ku tên raberkirin, divê dîsan ji aliyê kompaniyê ve werine wergirtin.

## Bijardeyên çendcarî

Derbarê pergalên çendcarî navbera pergalên hewza avjeniyê ya derve-navçeyî, pergalên yekparçe yên navçeyî digel kompaniyên din û rêkarên taybet û pisporî cihêwazî tê danîn. Di vî warî de bijartina sîstemê azad e.

### Pergala hewzê

Feraqên çendcar-bikarhatî ji aliyê kompaniyeke xizmetan an saziyekê ve tên dabînkirin. Mişterî dikarin feraqên xwe radestî her hevkarekî hewzê bikin.

### Pergala Yekparçe

Çend kompaniyên amadekirina xwarekê tev li hev dibin û feraqên aîdî heyîtiyeke kontrolkirî bi awayekî hevbeş bi kar tînin.

### Pergala Giravê

Kompaniya çêkirina xwarekê feraqên çendcar-bikarhatî yên taybet bi kar tîne. Brendîng û dîzzayna berhema taybet li vir pêkan e.

